KURTEÇÎROK

BIZIVIRE

Hesen Îbrahîm

-Bizivire... Ez neşêm bêyî…
-Min ji bîr bike... Ez neşêm di gel te bijîm.
-Were... Ez her yara caran im.
-Bibore, ez êxsîrê xerîbiyan im.
- Were, pirça min ya ji şekirina tilên te xerîb bûyî.
-Tilên min ji ber karî werimîne.
-Bizivire... Lêvên min ji eşqa simbêlên te dê har bin.
-Ji mêje min simbêl tiraşîne.
-Hêşta şûn ezmanê te li nîva memkên min diyar e.
-Hêşta gerdena min ji ramûsanên lêvên te diyar in...
-Hêşta rûyên min ji gezîna leqên te şariyayî ne.
-Hêşta... Hêşta... Hêşta
-Her bibêje û her vebigêre... Ne dilê min penîr e, û ne gotinên te kêr e.
-Pa dê ji kerema xwe bimire.